Nimûna Xulamê ne Diluvan

Petrus hate nik 'Îsayê u pisîar jê kir, "Ey Xudan, çend cara birayê min beramberî min gunneha bikit, ez lê biburim? Erê heta ḧeft cara?"

'Îsa bersiva wî da, "Ez dibêjime te, ne heta ḧeft cara u bes, belê heta ḧeftê u ḧeft cara!

Çunku paşatîa esmana weku paşatîê vîaî ḧisabê digel xulamêt xu bikit. Demê digel wan dest bi ḧisabê kirî, êk ji wan yê bi deh hizar derhemêt zîvî qerdar îna nik, belê ne bî qerê wî bidetê, xudanê wî ferman da, ku wî u jin u zaroka u her tiştekê hey bêne firutin, da qerê wî rabit. Vêca xulame kete ser çuka u gut, "Bêhina xu li min fireke u ez dê hemî qerê xu dim." Dilê xudanî ma bi xulameî ve, vêca berda u li qerê wî burî.

Demê ew xulam derketî, çû li hevalê xu yê xulame bigerîêt, ewê bi sed dînara qerdar dît. Ḧefka wî girt u gut, "Qerê min bide!" Vêca hevalê wî kete ser çuka u hîvî jêkirin u gutê, "Bêhina xu li min fireke dê dime te!" Belê razî ne bî u kire di zîndanê da, heta qerê xu bidit.

Demê hevalêt wî yêt xulam ev tişte dît, gelek pê nexuş bîn u çûn ev çende gutine xudanê xu. Xudanî jî gazî kirê u gutê, "Ey xulamê xirab ew qer hemî min bi te hêla, çunku te hîvî ji min kirin. Erê ma ne pêdivî bî te diluvanî bi hevalê xu yê xulame bir ba, herweku min diluvanî bi te birî?" Xudan gelek turre bî, da xudanêt qamçî, da zîndan bidin, heta qerê xu hemîê bidit.

Eha dê husa Babê minê esmanî digel we kit, heke her êk ji we ji dil li birayê xu neburit."

- Mizgînî ya Mettî 18:21-35

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.